995	<i>Kaniya qinê qinê, mîr û hekîm jî dest didinê</i>
996	<i>Kap avê vedixwe</i>
997	<i>Kap avê vedixwe, golik diwerime</i>
998	<i>Kaxez e çîzavîz, çû bajarê Ebdilezîz, tîne kêfa xort û qîz</i>
999	<i>Kaxiz hate dinê, mêr da destê jinê, jin got mêro, ev ne kaxizê xendinê</i>
1000	<i>Keçeke min heye, tirba xwe bi destê xwe dikole</i>
1001	<i>Keçika du kezî, ser serbanî ve bezî</i>
1002	<i>Keçika dukezî, serbanan ve bezî</i>
1003	<i>Keçika qazî, serê bana dibezî, dike hawar û gazî</i>
1004	<i>Kela goştî ne, pêpelîngê tê da hesinî ne, poblîska serê wê darîn e</i>
1005	<i>Kêlendiyê xwe hiltînim, diçim zeviyê diçinim, part dimîne cî da, zevî radibe diçe</i>
1006	<i>Kelpik çû ma dan</i>
1007	<i>Kepir çerim, pêpelîsk asin</i>
1008	<i>Keureka bê stûn e</i>
1009	<i>Ker bi bar ve çû di şkeftê ve</i>
1010	<i>Ker û bar ve diçe, dûvikê wê naçe</i>
1011	<i>Ker zirî, tersel firî, kê keve dibe mirî</i>
1012	<i>Ker zirî, posil/pişkil firrî</i>
1013	<i>Kera bi bar çû bin zinar</i>
1014	<i>Kêra kalanî, tor avêt ser xanî</i>
1015	<i>Kerê beqala, digerhit li ber derê hemî mala</i>
1016	<i>Kerê bi bar, çû qulika zinar</i>
1017	<i>Kerê etara, xwe zer kir ji bend û guhara</i>
1018	<i>Kerê etaran, xwe sor kir, ji bendik û guharan</i>
1019	<i>Kerê kur çû afir</i>
1020	<i>Kêrga dimdimî, tejî arê genimî</i>
1021	<i>Kerî kete ser stêr</i>
1022	<i>Kerika kerajo, kê te diajo</i>
1023	<i>Kerkî bavê min heye cil î bi zik, teng li ser piştê</i>
1024	<i>Kesk e rengê giya ye, zer e wek tîrojê e, spî ye wek berfê ye, reş e wek rejûyê ye</i>
1025	<i>Kevir e ne kevir e, çar pê ye ne dewar e, hêk dike ne tûtik e</i>
1026	<i>Kevzê mevzê, av tê dizê</i>
1027	<i>Kêw kir xurexur, rûyê xwe şa kir, rabî, erdîkî rakir</i>
1028	<i>Kewa kejo, li hewa re diajo</i>
1029	<i>Kewara agir, hevîr dike nanê hazir</i>
1030	<i>Kiça mela, bi hizar kirasa</i>
1031	<i>Kidî kidî mistan e, çil dergûş li destan e, ne ber e ne bistan e</i>
1032	<i>Kilît ji dêr, mifte ji avê, nêçîr çû, nêçîrvan ma navê</i>
1033	<i>Kir nekir min yaz nekir, min nêrî min nas nekir</i>
1034	<i>Kir xişt e xişt, çû dira he rûnişt</i>
1035	<i>Kirdî kidî mistan e</i>
1036	<i>Kirina wî ferz e, birin û anîna wî sunnet e</i>
1037	<i>Kite çarix, şeş bençarix</i>
1038	<i>Kofiya delalê, baz da newalê</i>

1039	<i>Kofiya Xezalê</i>
1040	<i>Kofiya xezalê dol bû newalê</i>
1041	<i>Kofiya xezalê gêr bû newalê</i>
1042	<i>Kofiya Xezalê, dot bû newalê</i>
1043	<i>Kofiya xezalê, kilîlî bû çû devê newalê</i>
1044	<i>Kofiya xezalê, tûtiya newalê</i>
1045	<i>Kok di erdê da, serî li or, orte di te da</i>
1046	<i>Koka xwe berjor e, guliyê xwe berjêr e, livê dinyayê</i>
1047	<i>Kon e bê stûn e</i>
1048	<i>Koneka tarî, tijî tê da durr û mirarî</i>
1049	<i>Konekî min heye ser stûnekî, heştê hezar kitêb bin kon da</i>
1050	<i>Koşka tarî û bi mar, bi dûpişk û cinawar</i>
1051	<i>Kozka kara, wa l'nizara</i>
1052	<i>Ku çi tişt e, pêva ye, ev çi ye</i>
1053	<i>Kudinikê du qûnik</i>
1054	<i>Kulavê pevdadayî, ji vir heta Bexdayê</i>
1055	<i>Kumê dirêj, tije qirêj</i>
1056	<i>Kumê gup û bi dirî</i>
1057	<i>Kumê hezî tije derzî</i>
1058	<i>Kumê hûtik</i>
1059	<i>Kumê hûtik, tije nûtik</i>
1060	<i>Kumê mellê, li ser golê</i>
1061	<i>Kumê sorik, tijî morik</i>
1062	<i>Kumê xezalê, gêndir bû newalê</i>
1063	<i>Kumê xezalê, gêr bû newalê</i>
1064	<i>Kumikê xezalê, gêr bû newalê</i>
1065	<i>Kundirê di latê de, tamên vê qa dinyayê tê de</i>
1066	<i>Kûr tê ji dûr tê, gava vedireşe xwîn tê</i>
1067	<i>Kûr tê, dûr tê, vedireşe xûn tê</i>
1068	<i>Kurê kerê çû ser benderê, kayê dixwe, nade kerê</i>
1069	<i>Kurtan e heçî nezan heywan e</i>
1070	<i>Kurtan lê ye ne ker e, xwedî qoç e ne ga ye</i>
1071	<i>Kurtanê wê heye ker nîne, qiloçê /qoç wê heye ga nîne</i>
1072	<i>Kutan dikî ne dar e, serî mişk e, ne mar e, diçêre ne ker e</i>
1073	<i>Laliya savarê, ser çiqilê darê</i>
1074	<i>Lat û lat, min pê tev da evqas welat</i>
1075	<i>Lawê zerê di qesra sipî da</i>
1076	<i>Lawik bang dike diyê, ez naçim xerîbiyê</i>
1077	<i>Lawikê kumsor</i>
1078	<i>Lawkê deştanî, çû serê banî, qûn tîjtir e ji didanî</i>
1079	<i>Lawkê Elmana, digerît li kolana/ser bana, qûn tîjtir e ji didana</i>
1080	<i>Lem lemo, li devê çemo</i>
1081	<i>Lemê lem da, behrê kef da, mar çû, marezerk di dev da</i>
1082	<i>Lemê lem da, kefê kef da, mar hat marmasî di dev da</i>
1083	<i>Lêv reş e bi qîmet, nav sor e bi helamet, bi terî dibemê, bi hişkî dînime der, sela ela pêxember</i>
1084	<i>Lez e bez e, wekî fesal hev e, wê merîya vegezive</i>
1085	<i>Li Amedê şîr rijiya, bêhna wî hat vira</i>

1086	<i>Li avê dixim naşkê, li teht dixim dişkê</i>
1087	<i>Li berî bidey çî lê nahêt, li avê bidey dişikêt</i>
1088	<i>Li berojî ji tirsî dimirin, li nizarî ji bîrsî dimirin</i>
1089	<i>Li bin erdî pata dîkî</i>
1090	<i>Li binê kevrî bide naşkê, pavê di şikeftêka tarî de dişkê</i>
1091	<i>Li çiyê deng dide, tê li malê pal dide</i>
1092	<i>Li çolê heşîn e, li çarşiyê reş e, li malê sor e</i>
1093	<i>Li dîwar e, ne kewar e, qor bi qor e, wekî per e, tişt li ser e, kî nezane ew ker e</i>
1094	<i>Li dur te wertêt û te nagêt</i>
1095	<i>Li erdê weke gîsk e, li ezman weke nîsk e</i>
1096	<i>Li gund bê deng e, li daristanê bi deng e</i>
1097	<i>Li hewa nîsk e, li erdê gîsk e</i>
1098	<i>Li hewa re diçe, baskê wê tune, mînanê şekir e, tama wê tune</i>
1099	<i>Li jor disekine, mirov ji berf û baranê diparêze</i>
1100	<i>Li jor disekine, mirov ji berf û baranê diparêze</i>
1101	<i>Li kuç didim naşkê, li avê didim dişkê</i>
1102	<i>Li malê piştî xwe dide dîharê/dîwar seqîn, li çolê dikê teqîn</i>
1103	<i>Li mam heye li xal tune, li mal heye li bal tune</i>
1104	<i>Li mam heye, li xal tune, li mal heye, li bal tune</i>
1105	<i>Li maxa bi dîwarî, çar çivê bi kerî, wekî derî, roj jê dibarî, têk diçe tarî</i>
1106	<i>Li mirov dikeve dibore, xuya nake dizûre</i>
1107	<i>Li ser destan dişemite, dikeve çav dişewite</i>
1108	<i>Li ser destan dişimite, dikeve çav dişewite</i>
1109	<i>Li ser erdê naçe, li ser berfê diçe</i>
1110	<i>Li ser erdê naçe, li ser golê diçe</i>
1111	<i>Li ser gîrekî sê rê terin/derin</i>
1112	<i>Li ser golê naçe, li ser erdê diçe</i>
1113	<i>Li ser refikê, ronî dide defikê</i>
1114	<i>Li serê carekî, kuta bizmarekî, deng çû hezarekî</i>
1115	<i>Li sûkê yek e, li malê gelek e</i>
1116	<i>Li teht û zinaran wer dikî namire, avê lê dikî dimire</i>
1117	<i>Li vê derê dibe rêz, li wê derê dibe fêz</i>
1118	<i>Li vê dinya, qafîkî de sê kanî dertên</i>
1119	<i>Li vî alî kaş, li wî alî kaş, di nav de heye topek qumaş</i>
1120	<i>Li vî alî mijang, li wî alî mijang, li navê morî û mircan</i>
1121	<i>Li vî alî text, li wî alî text, di ortê da kalekî bêbext</i>
1122	<i>Li vir dişînim, li Bexdayê hiltînim</i>
1123	<i>Li vir xîşt, li ardê din qûna xwe almoşt</i>
1124	<i>Li wî alî ber, li vî alî ber, di navê de mîr Emer</i>
1125	<i>Malek bêderî, tijê serî</i>
1126	<i>Malîkî mino, tu bi nikilî ve</i>
1127	<i>Mam Hesênê bi lingekî, çû şerê gondekî</i>
1128	<i>Mam Hesênê bi lingekî, çû serê gundekî</i>
1129	<i>Mamê memo, bi lingekî, çû şerê gundekî</i>
1130	<i>Mamê min bi lingekî, hemberî gundekî</i>
1131	<i>Mamê min e, lawê zer e, yê di qesra spî da</i>
1132	<i>Mamê min e, li ser şafîk, li ber dafîk</i>

- 1133 Mamê min Heyder e, sê qutkên li ber e, du sipî ne êkê zer e
 1134 Mamê min î mam belek, dest û tilî tir çêlek
 1135 Mamê mino, ez çûme serê milekî, min kir hişkehewarekî, sed mêr hatin bi carekî
 1136 Mamê mino, kê dîtiye goştê bigaris
 1137 Mamê te exmûr, da kaşê dûr, serî lê bî ûr
 1138 Mamê te mam êlek, dest û tilî çerm êlek, daxdane q.zê çêlek
 1139 Mamê Xelîl e, dergihê wî bi kilîl e
 1140 Mamekê min li deştê, barekê sitirîya li piştê, dikit nakit destê wî nagihite piştê
 1141 Mamgê mino mamanî, hêlik reş û mêrganî
 1142 Mamgê mino, pap çû ma danê kutayî
 1143 Mamgî minî mamanî, aşê dêm çî ye
 1144 Mamigê mino mamanî, çarsim axa diçe nav taxa
 1145 Mamigê mino mamanî, çêlegoga zarik ji xwe re digere
 1146 Mamigê mino mamanî, çêrogê çêrvanogê, pîrga mi çû gozbelogê
 1147 Mamigê mino mamanî, fena ser fenê, derxûna ser devê denê
 1148 Mamigê mino mamanî, gayê qut, datkî bidûv
 1149 Mamigê mino mamanî, hingî soyî ez radibi, sofîgê di berê ciya te de
 1150 Mamigê mino mamanî, hûr e hûr e, ji kilê siphani hûrtir e, ji minara Sêrtê bilindtir e
 1151 Mamigê mino mamanî, ji hire heta Manîsa bî virvira telîsa
 1152 Mamigê mino mamanî, kalê Misûranî, jiniga Deştelanî
 1153 Mamigê mino mamanî, me bînderî ka hilanî, liva ji kayê zîdetir anî
 1154 Mamigê mino mamanî, min xwihek heye, her soyî edaw li bin dikevi
 1155 Mamigê mino mamanî, piyana cam li erdê ket, deng li dinê ket
 1156 Mamigê mino mamanî, sed avê vedixwin, du sed seyrê dikin
 1157 Mamigê mino mamanî, ser cûce, bin cûce
 1158 Mamigê mino mamanî, tajiya Elî Mirada205, dûvê xwe li çema de bada
 1159 Mamigê mino mamanî, zerik goştinî, girar qîrînî, hesko darînî
 1160 Mamika mino, yekî delîquç
 1161 Mamikê mamo, hêlîna şimşedarî, ne li berojî ne li nizarî
 1162 Mamikê min ê lingdar, çû ser darê xwar
 1163 Mamikê min ê mamanî, çar kirasê li ber e, sisîyê sipî ye, yekê zer e
 1164 Mamikê min ê mamanî, ez digirim val e
 1165 Mamikê min ê mamanî, ji têrê ye, ji rêrê ye û ji kêrê ye
 1166 Mamikê min ê mamanî, ji vira û derî, kişt xwe berda serî
 1167 Mamikê min ê mamanî, ji vira û Mûsil, moriya sinsil
 1168 Mamikê min ê mamanî, qilingo milingo, çar desto, du lingo
 1169 Mamikê min ê mamanî, sê bira lêk difeke
 1170 Mamikê min ê mamanî, şe qil dîwarî
 1171 Mamikê min ê mamanî, ser mazî ye, qûn derzî
 1172 Mamikê min ê mamanî, ser qulîpançî zirçine, iyar hene mû tune
 1173 Mamikê min ê mamanî, serî steyr e, binî behr e
 1174 Mamikê min ê mamanî, sermişar e, pêxepar e, heçî nezane dewar e
 1175 Mamikê min ê mamanî, vî milî teht e, wî milî teht e, navê de şil û şeh e
 1176 Mamikê min e mehîna spî ye, rişiyên wê şîn in
 1177 Mamikê min e, behra sor e, masî di reş
 1178 Mamikê min e, dilivlive ezman nîne, pê baxive
 1179 Mamikê min e, dirêj e teng e, kurt e teng e, fireh e teng e, teng e teng e û her teng

- 1180 Mamikê min e, ew rex dîwar e, ev rex dîwar e, nîvekê seyê har e
 1181 Mamikê min e, ga di gelî da ne, gelî dirize, ga narize
 1182 Mamikê min e, hespê çê ye, tev qeyd û zincîr e, diçe ser e
 1183 Mamikê min e, kelexê mêşan e, dengê şeşan e
 1184 Mamikê min e, kevilê ga ye, di avê de maye, ne nimya ye
 1185 Mamikê min e, mela ye mela nîne, aqildar e rih tê nîne
 1186 Mamikê min e, mirî dar e, tabût goşt e
 1187 Mamikê min e, sê mela bi şaşkekê
 1188 Mamikê min e, sê ne, nabin çar
 1189 Mamikê min e, sed û yek bira ne, rîvyek bi tenê ye
 1190 Mamikê min e, ser seyîd e, nîv mela ye, bin sofî ye
 1191 Mamikê min e, yê mirî ye, mirovan bi girî berdide
 1192 Mamikê min î, pira darîn î, koça axîn î, xwerê wê giyayê şîn î
 1193 Mamikê min nîne, dar e ne li axê ye
 1194 Mamikê min o, çûm şkeftekê, tijî gopal in, yekî wisa nebû, bi dest xwe bigirim
 1195 Mamikê minê mamanî, ji vira heta Mûsil, hemî moriyên sinsil
 1196 Mamikê minê mamanî, me bênderek hilanî, genim ji kayê pirtir anî
 1197 Mamikê minî mamanî, yekî serê xwe li serê te û diya te da
 1198 Mamikê mino ji mamikan, rojê sê caran, tu nanî didî sersorkê qasimî
 1199 Mamikê mino mam e, ecêba min ew ecêb e, mahîna bi şeş rikêb e, kurrya bi nîva piştê ve
 1200 Mamikê mino mamalê, dest û tilî çermêlî
 1201 Mamikê mino maman e, heft bizinêd
 1202 Mamikê mino maman e, heft bizinêd rûtêt til diryayî, şax kopêd didan veweryayî
 1203 Mamikê mino mamanî, bê pê ye ser banî, qûn tîjtir e ji didanî
 1204 Mamikê mino mamanî, ez li hire deynime, ew li wê dera he hişîn dibe
 1205 Mamikê mino mamanî, hefsed û yek mirov, di bin beteniyekê da razane
 1206 Mamikê mino mamanî, rê ve diçit bê pê ye, digirt bê çav e
 1207 Mamikê mino mamanî, teyr şanzde salan, li ser hêlîna xwe nafire
 1208 Mamikê mino mamanî, yê li bin mêwek sadanî
 1209 Mamikê mino mamanî: hildim bildim, şeş pê û du sim
 1210 Mamikê mino mamik e, yê bi sê lingan e, yarê jinkan e
 1211 Mamikê mino, adlim Didim, şeş pê û du sim
 1212 Mamikê mino, arqulik û darqulik, deh û du qulik
 1213 Mamikê mino, aş e aşe çend xeraş e, du li paş du li pêş e
 1214 Mamikê mino, asin û bizin gayê mezin, pêk ve dibezin
 1215 Mamikê mino, asinê sar, kun dîwar, heta bihar
 1216 Mamikê mino, bab ciwan e, law rihspî
 1217 Mamikê mino, bab yê razayî, biçûk û miçûkan, serên xwe pê ve nayî
 1218 Mamikê mino, bab yê şîn e, kur yê şirîn e, neví yê dîn e
 1219 Mamikê mino, ban çerm e bagirdan asin
 1220 Mamikê mino, bapîrê te dapîra te, dikete piştê xwe
 1221 Mamikê mino, baxçekî dehlê me heye, keteka xwar tê da nîne
 1222 Mamikê mino, bazinê xezalan, çû binê newalan
 1223 Mamikê mino, bê ser û bin e, belav dibît hindê dinê
 1224 Mamikê mino, bejna wê bejna bûkan, hêka wê hêka çûkan
 1225 Mamikê mino, berhev diken barê ga ye, danin erdî wekî çiya ye
 1226 Mamikê mino, bi kulav û depik e, wisa dixwet ne karik e

- 1227 Mamikê mino, Bi şev cêrî ye, bi roj xatûna
- 1228 Mamikê mino, bi şevê kesk dikin, bi rojê sor dikin
- 1229 Mamikê mino, bihara pişkoj e, havîna geş e, payîza bêhnxeş e
- 1230 Mamikê mino, bilbilê bi hezar dangan e
- 1231 Mamikê mino, bîst mêrêt dirî, hatine barek tirî, neşyan barken lewra berda girî
- 1232 Mamikê mino, bûk li hundur e, pora wê li der ve ye
- 1233 Mamikê mino, çalika qutik, tijî av
- 1234 Mamikê mino, çantika min e, du nan diçin tê da
- 1235 Mamikê mino, çar bira ne, di xetekê de cotî diken
- 1236 Mamikê mino, çar di çikê, du di maçikê, heşt di çipetirê
- 1237 Mamikê mino, çar in nabin pênc
- 1238 Mamikê mino, çêlê jûr ve za, golkî banî reqîsî
- 1239 Mamikê mino, çêlek diore, golik mezin dibe
- 1240 Mamikê mino, cemik in li kêlek in, ne goşt in, belê nermik in
- 1241 Mamikê mino, çik dikim diçikînim, li dîwêr dadiliqînim
- 1242 Mamikê mino, çiyayekî diwanzde mil, her milekî sih dar tê da ne, har darekê pênc gul pê ve ne
- 1243 Mamikê mino, cot bira ne, bê didan e
- 1244 Mamikê mino, çûm çûm du gulên geş, çûm çûm du çirayên geş
- 1245 Mamikê mino, çûm goveke bêder, tijî tê da mihên qer
- 1246 Mamikê mino, çûm ji vir pê da, cuhyek yê di rê da, lingê gê li ser piştê da
- 1247 Mamikê mino, çûm şikefteke kûr, tijî tê da bizinên çûr
- 1248 Mamikê mino, çûm şikeftekê, tijî bizinên bi şaxekî
Mamikê mino, çûme aşekî kes lê ne, min pirsyar kir çu av û hevran lê ne, min gotê tu çi tişt î? Got: ez
- 1249 hesabdarê dinê me
- 1250 Mamikê mino, çûme derî, ecêbiyek hate serî, dar diqutî berî
- 1251 Mamikê mino, çûme ji vir pê da, kaniyek ya di rê da, saxilî legenekê tê da
- 1252 Mamikê mino, çûme li ser darekê, dikem hişkehewarekê, sed têne xwarê carekê
- 1253 Mamikê mino, çûme mêrgeke şîn, du mar tê da xişîn, yek hesp e yek mehîn
- 1254 Mamikê mino, çûme şarê şik tê ne, goştî dixem hestî tê ne
- 1255 Mamikê mino, çûme şikeftekê da, heft mal diçûn pê bizinê da
- 1256 Mamikê mino, çûme şikeftekê tijî tefş û telaş
- 1257 Mamikê mino, çûme şikeftekê, tijî sofiyêd ser bişaş
- 1258 Mamikê mino, çûme şikefteke tarî, tijî tê de mirarî
- 1259 Mamikê mino, çûme şikeftekî tijî tefş û telaş, çûme jortir du kunêd roviyan
- 1260 Mamikê mino, dapîr têtin ji deştê, piştîyê qirşika li piştê
- 1261 Mamikê mino, dar e ya li nav daran, jê têt dengê birîndaran
- 1262 Mamikê mino, dara li nav avê, pênc katan davê, sê li sihê du li tavê
- 1263 Mamikê mino, dara li nav daran, zer diket wek guharan
- 1264 Mamikê mino, dara nav avê, avê da navê, çûçika li ser, nikilzer
Mamikê mino, daran movik îna, maran hingivîn îna, mihan şîr îna, fesad tazî man, mîran xwe da alî,
- 1265 gayan şer hilanî
- Mamikê mino, darek e, li ser darê hinarek e, li ser hinarê gopalek e, li ser gopalê rist e, li ser ristê bihust e
- 1266
- 1267 Mamikê mino, darekê çar sêv pê ve bûn, mamoste û jina xwe, hekîm û keça xwe
- 1268 Mamikê mino, darekî du ta, di lingê te quta, anko dibêjin; serî yek e bin du
- 1269 Mamikê mino, darekî li dinê, pênc ta diçinê, sê li sîberê, du li hetavê
- 1270 Mamikê mino, davêje paniya pê, tê bi difinê dikeve

- 1271 Mamikê mino, dayik asin bab ber e, jê diçît gurya zer e
 1272 Mamikê mino, dayik ji kêran, keç ya li bajêran
 1273 Mamikê mino, dayikek jêhatî, tim xwelî li ser hatî
 1274 Mamikê mino, deh bira ne, her deh têne deştê, her yekî ferşek li piştê
 1275 Mamikê mino, deh in nabin yanzdeh
 1276 Mamikê mino, deh li dûyan, ser li qûnê, qûn li erdê
 1277 Mamikê mino, deng ji bin têt, ser diçemît
 1278 Mamikê mino, dengê tê danganek tê, dengê tewş û tirara tê, xwe li binê behra didê
 1279 Mamikê mino, dep e ne darik e, stûqaqîçk e, hêka dike, ne mirîşk e
 1280 Mamikê mino, dersûka mermerî, tijî şevêde heyderî
 1281 Mamikê mino, dest û pê çermanî, xwe hilavît çaçanî
 1282 Mamikê mino, di nîveka du geliyan, direve seyekî har
 1283 Mamikê mino, di qulekê de, keriyekî pez e
 1284 Mamikê mino, diçim naçim nagîjimê
 1285 Mamikê mino, diçim newalan, tê xwişîna maran
 1286 Mamikê mino, diçim ser zinarekî, diqutim bizmarekî, deng diçît hezarekî
 1287 Mamikê mino, diçînin kêçan, radibin wek rîman
 1288 Mamikê mino, diçîte mistê, naçîte teştê
 1289 Mamikê mino, dihêt wekî hakimî, dirûne wekî wezîran, diçe wekî feqîran
 1290 Mamikê mino, dîkilek e dîkvanek, çar mih û beranek
 1291 Mamikê mino, dileyize lê nabeze
 1292 Mamikê mino, dinya hemû li ser niklê wî ava ye
 1293 Mamikê mino, diwazde ne nabin sêzde
 1294 Mamikê mino, dixwe û narît
 1295 Mamikê mino, dizê jûr ve serê der ve
 1296 Mamikê mino, dîzika tijî îprax, serê kendalî çû binî, dinkek tenê jê nerîştî
 1297 Mamikê mino, dizivîrît wekî aş e, diket şûlê mîr û paşe
 1298 Mamikê mino, dox dirêj e, naçe tûr
 1299 Mamikê mino, du bend û bendilkek e, du nan û kutilkek e
 1300 Mamikê mino, du ebareşan, daye kaşekî
 1301 Mamikê mino, du kulekêd bêderî, roj girtî şev vekirî
 1302 Mamikê mino, du lingo bi rê ket, çîzo vîzo bi dû ket
 1303 Mamikê mino, du sêvên gurover, li ser sîngê sor û zer
 1304 Mamikê mino, du ye nabe sê
 1305 Mamikê mino, du yêd çeçê, çar yêd maçeçê, heşt di fitefelekê
 1306 Mamikê mino, du yekê ve yek yekê ve, pindirê fiskê rêkê ve
 1307 Mamikê mino, duwanzde mil in, her milekê sih şiv in, her şivekê pênc gul in
 1308 Mamikê mino, ê mirî yê sax hildigire
 1309 Mamikê mino, eba berleko, li nav beyaran
 1310 Mamikê mino, eger bi bar e çar pêyan e, eger bê bar e bi şeş piyan e
 1311 Mamikê mino, eger hat wezîr e, eger rûnişt mîr e, eger rabû êxsîr e
 1312 Mamikê mino, eger rabû hindî çiyayekî ye, eger raza hindî gayekî ye
 1313 Mamikê mino, Ehmedê lingekî, diket şerê gundekî
 1314 Mamikê mino, elîfê gote cîmê, qafê bibe bo mîmê
 1315 Mamikê mino, erebê reş dayka te hambêz kir
 1316 Mamikê mino, esmanê tarî berf dibarî
 1317 Mamikê mino, esmerê sê kiras li berê, du spî ne yek zerê

- 1318 Mamikê mino, êvarê reştarî bû, bû sibe çikspî bû
- 1319 Mamikê mino, ew di hundirê malê da, mal di hundurê wê da
- 1320 Mamikê mino, ew dijminê xwe ye, xelk û alem jî dijminê wê ye
- 1321 Mamikê mino, ew ê çê dike nebûye, ew ê bikire bi kar nîne, ew ê bi kar tîne nabîne
- 1322 Mamikê mino, ew tacek zêrîn e, li ser serê her kesekê nîne
- 1323 Mamikê mino, ez çûm newalekî, dihat nalenala birîndarekî
- 1324 Mamikê mino, ez çûm serê banekî, dibînim bostanekî, heft zincîr devê marekî
 Mamikê mino, ez çûme diyarekî, newalek li ser newalekî, panav li panavê bû, li serê panavê gopalek bû
- 1325
- 1326 Mamikê mino, ez çûme ser milekê, min berê xwe da helanekê, hemî bûkên salekê
- 1327 Mamikê mino, ez çûme serê milekê, min berê xwe da helanekê, hemî dîngên beranekê
- 1328 Mamikê mino, ez çûme serê milekî, piyê min kete qulekî
- 1329 Mamikê mino, ez diçim ew nahêt
- 1330 Mamikê mino, ez ji serî dikim dirêj dibe, ez ji rexê dikim pehn dibe
- 1331 Mamikê mino, ferec ferec, her ferecek hezar derec, ew qûtek e yêd qenc
- 1332 Mamikê mino, firto fiyo, li nav deviyo
- 1333 Mamikê mino, fitlek giya li pişt çiya
- 1334 Mamikê mino, ga di kunê ve dinive, giya li mila digurze
- 1335 Mamikê mino, garanek hat helme helme, golikê dumahiyê heft çerm e
- 1336 Mamikê mino, garanek hate ber me, Xwedê pê dizanît, mûçkê biçûk heft çerm e
- 1337 Mamikê mino, gayê nav govê nivistî, pelpîne rexî ristî
- 1338 Mamikê mino, gayê nivistî, pêbenê ve veristî
- 1339 Mamikê mino, gel şaxê spêdê, dizek tête xanî
- 1340 Mamikê mino, gewr e gewerol e, dike hêkên girover e, dixuşîne ne mar e
- 1341 Mamikê mino, gilvilkî av didin, golik mezin dibin
- 1342 Mamikê mino, girêbest e tijî dest e
- 1343 Mamikê mino, gireka bizmaran, wa li pişt malan, ji bo car û baran
- 1344 Mamikê mino, girêka mû, li serê çiyar belav bû
- 1345 Mamikê mino, girkê bert e, du şikeft tê d
- 1346 Mamikê mino, girkê sor e, pêş malan e
- 1347 Mamikê mino, giroverê bi giranî, rûniştiye li ser xanî
- 1348 Mamikê mino, gîskê gurî, çû devê avê nîrî
- 1349 Mamikê mino, gîskê gurî, li ser avê nîrî
- 1350 Mamikê mino, gîskê gurrî, li dev avê nîrî, heft batmanan bo te û bo babê te dirî
- 1351 Mamikê mino, golkê melayî, zilek nehêla, li serê çiyayî
- 1352 Mamikê mino, goşt heram e, şîr helal
- 1353 Mamikê mino, guhbelo bi rê ket, girovero bi ser ket, xeftanzero bi pey ket
- 1354 Mamikê mino, gulolka dezî, bi betenê ve bezî
 Mamikê mino, gurover e ne gok e, sor e ne sêv e, nava wê spî ye ne penîr e, teriya wî heye ne mişk e
- 1355
- 1356 Mamikê mino, gûyê mêşan, xwarina axan
- 1357 Mamikê mino, hacîlokê navtengbestî, ne goşt tê da ne hestî
- 1358 Mamikê mino, hakimê li ber dîwara
- 1359 Mamikê mino, hê ve lat e, wê ve lat e, ya di nav da pîrefat e
- 1360 Mamikê mino, heçkê du ta, xwe nav lingê babê te quta
- 1361 Mamikê mino, heft gira gerî, li xwe ve gerî
- 1362 Mamikê mino, heft in nabin heşt

- 1363 Mamikê mino, heft qul û qultinîk li ser
 1364 Mamikê mino, heke girêden diçît, heke berden radiwestît
 1365 Mamikê mino, helbest helbest, avka mezin şilqa li xwe didet
 1366 Mamikê mino, helhele ba bû, reşhêle siwar bû, piçûk û mezin pê şa bû
 1367 Mamikê mino, helhelê, mîrê kelê, rih heye simbêl belê
 1368 Mamikê mino, hemî dinya diçîtê, lê destek kayê naçîtê
 1369 Mamikê mino, Hemzêko, piştta xwe veneke
 1370 Mamikê mino, her bilind e bilindtir, kur ji babî bilindtir
 1371 Mamikê mino, her dem zir e, ji babê xwe mezintir e
 1372 Mamikê mino, her ji vir heta sindor, hemû cihûyên ritilsor
 1373 Mamikê mino, her ji vir ta Şam
 1374 Mamikê mino, hero deyka te, qewdek şîşkan dişo
 1375 Mamikê mino, herro êvar tu gûyê xeftanreşo dixwî
 1376 Mamikê mino, heta hindê nebe te, çi nadete te
 1377 Mamikê mino, heybet heybet e, ava bana şilqa li xwe didete, tuy jê diçin, kata li xwe dide
 1378 Mamikê mino, hezar û heftsed feqe, di bin berikekê de radizên
 1379 Mamikê mino, hil hil e, di hil hil de ne
 1380 Mamikê mino, himhim e dîwar sim e
 1381 Mamikê mino, hin im dî hinar im dî, ritil nav singan im dî, rû li nav lîngan im
 1382 Mamikê mino, hind ji min hind ji bizin, hind ji gayê mezin, em hemî pêk ve dibezin
 1383 Mamikê mino, hindî bidenê, têr naxwe
 1384 Mamikê mino, hindî dayika tepê da dide, dirîte bi xwe ve
 1385 Mamikê mino, hindî xwe kurê werdidet, her paqij e
 1386 Mamikê mino, hinit diket minit diket, nîva malê kun diket, malxê malê bîjin diket
 1387 Mamikê mino, hir ve ax, wê ve ax, di nîvekê da, mîr bidax
 1388 Mamikê mino, hir ve dar, wê ve dar, yê di nav da seyê har
 1389 Mamikê mino, ho dibêjim tevşo dibêjim, bi nav dikim lê nabêjim
 1390 Mamikê mino, ho dike ho dike, li derê bazaran kar dike
 1391 Mamikê mino, ho dike ho dike, li dora qûna te dike
 1392 Mamikê mino, ho ve mil e wê ve mil e, yê di nîvekê de mîr kovil e
 1393 Mamikê mino, ho ve tat e, wê ve tat e, di nîvekê pîrefat e, hingek lê da û ji ber hate
 1394 Mamikê mino, holekê bavêje dolekê, dol dirize, hol narize
 1395 Mamikê mino, holekê di kevir de, bavêje naşikê, bavê kulê dê şikê
 1396 Mamikê mino, holhol dike, golgol dike qesta derê Stenbol dike
 1397 Mamikê mino, hû ve dar e wê ve dar e, wê di nav de seyê har e
 1398 Mamikê mino, hû ve dep e wê ve dep e, di nav da sil e sep e
 1399 Mamikê mino, ihim ihim iho, du per, du mû, sîngê şêra, çavên mara, pir dirende û ecayib
 1400 Mamikê mino, ji berfê spîtir e, ji xwîne sortir e, ji qîrê reştir e
 1401 Mamikê mino, ji caran carek e, ji yekê derket hezarek e
 1402 Mamikê mino, ji çûçikê biçûktir e, ji minarê dirêjtir e, ji derziyê ziravtir e
 1403 Mamikê mino, ji jehrê taltir e, ji şekirê şirîntir e, ji sêvê biçûktir e, ji dûvê mihan bi rûntir e
 1404 Mamikê mino, ji min pekya, di te çikya
 1405 Mamikê mino, ji vir heta bilbil, hemî lawên çavkil
 1406 Mamikê mino, ji vir ta alokan, hemî pinyên kerkolkan
 1407 Mamikê mino, ji vir ta Mûseka, hemî ritlên gîska
 1408 Mamikê mino, ji zikê deyka xwe derdikeve, piştta bavê xwe dixurîne
 1409 Mamikê mino, ka çû ma dan

- 1410 Mamikê mino, ka nokan e, heçî yê nizane, ew nezan e
 1411 Mamikê mino, kalê pîr, civata mîr
 1412 Mamikê mino, kanî çerm e, av ber e, dolik dar e
 1413 Mamikê mino, kaniya kevezê av tê dizê
 1414 Mamikê mino, kaniya kezê, mîr merezê, av tê nezê
 1415 Mamikê mino, kaniya min e, jê diçin heft co, yek şîrîn e
 1416 Mamikê mino, karika kejik, li ser hejîk
 1417 Mamikê mino, kaxezek hate ji bin dinê, qet nayête xwendinê
 1418 Mamikê mino, kebanî her roj serê zava dişot
 1419 Mamikê mino, kêla bi çavekî
 1420 Mamikê mino, ker bi bar ve diçe jor, lê kurrî naçe jor
 1421 Mamikê mino, kero kero, kayê dikem bero, hêdî hêdî dibêmê wero
 1422 Mamikê mino, keziya xezalê, davêje newalê
 1423 Mamikê mino, kina malê, çavê gelekên lê
 1424 Mamikê mino, kun ser kunê, şûlê jinê
 1425 Mamikê mino, kurê kerê li ser bêderê, kayê dixwe nade kerê
 1426 Mamikê mino, kurê kurê mino, birayê mêrê mino
 1427 Mamikê mino, kûrka tarî, agir jê barî
 1428 Mamikê mino, landarek ya li hewa, biçûkek yê di xewa
 1429 Mamikê mino, lê da hitik, ketî kudik, bo ji dil mexnik
 1430 Mamikê mino, leşê wî reş e, serê wî kesk e, dilê wî spî ye
 1431 Mamikê mino, li çiya deng didet, li malê pal didet
 1432 Mamikê mino, li dor te dîzivire, lê nagihîte te
 1433 Mamikê mino, li dû te dîzivire
 1434 Mamikê mino, li kerekê siwar dibe, ruh tê nîne, du berana dixwe, hestî tê nîne
 1435 Mamikê mino, li nav dehlê babo, gayên xezalo
 1436 Mamikê mino, li vir keliya, li Stenbolê Fûriya /firiya
 1437 Mamikê mino, li vir keliya, li Stenbolê fûriya/firiya
 1438 Mamikê mino, mahîna boz, li meydanê kir toz
 1439 Mamikê mino, mahîna li canî, caniya li banî
 1440 Mamikê mino, mahîna melayî, berdan çiyayî, zilek nehêlayî
 1441 Mamikê mino, mamanî, bapîrê min lingekî, diket şerê gundekî
 1442 Mamikê mino, mar hilûsî di kunê da, heçî yê hat hingek lê da
 1443 Mamikê mino, marê mirî erd kunkirî
 1444 Mamikê mino, mela bi jina xwe ve, keşe bi keça xwe ve, çûne bi dêrê ve, hatin sê ji wê ve
 1445 Mamikê mino, mela bi rihan hilawistî ye
 1446 Mamikê mino, melayê du şaşîk serî
 1447 Mamikê mino, mêrê ne li oxaxê
 1448 Mamikê mino, meşka sengîn, tijî tê da garis û hinguvîn
 1449 Mamikê mino, metelok metît e, porsil kete ortê te
 1450 Mamikê mino, mezela sultan e, ne li erd e, ne li ezman e
 1451 Mamikê mino, min birayek heye, herro diçe malekê
 1452 Mamikê mino, min kurrî yek, li mal bû sed û yek
 1453 Mamikê mino, nan dizî da kurê kumsor, kumsorî da rêza siwaran, siwaran kir kumêd dîwaran
 1454 Mamikê mino, nan dizî da kurê kumsor, kumsorî da rêza siwaran, siwaran kir kumêd dîwaran
 Mamikê mino, navê wê navê Pêxember e, bêhna bêhna Ember e, cihê lê seyrangêh e, heke we zanî
 1455

- 1456 Mamikê mino, ne ker e, ne hêstir e, bar ji qalib, mezintir e
 1457 Mamikê mino, ne kulek e ne der, tê da bûka zer
 1458 Mamikê mino, ne li erd e, ne li ezman e, hêlîna betrewan e, şiva destê însan e
 1459 Mamikê mino, neh in nabin deh
 1460 Mamikê mino, newala kûr, tijî genimê hûr
 1461 Mamikê mino, pê digirim diçe axur, pê nagirim naçe axur
 1462 Mamikê mino, pêçiya bi kevrî ve ye
 1463 Mamikê mino, pêk pêk danî, li ber xanî
 1464 Mamikê mino, pênc bira hene, sê rojê dibînin, du nabînin
 1465 Mamikê mino, pênc bira ne, her yekî selek li piştê
 1466 Mamikê mino, pênc bira ne, hindî dibezin, yek û dû ra nagehin
 1467 Mamikê mino, pênc in nabin şeş
 1468 Mamikê mino, pezê hemeşîn, berdan nav geleşîn, ne didoşin, ne difroşin
 1469 Mamikê mino, pezê payizê kuştî, biharê şûştî, wê gavê şûştî, heku kuştî
 1470 Mamikê mino, pind li erdê, ser li pindê
 1471 Mamikê mino, piqîn li nizarê Kurdistanê
 1472 Mamikê mino, pir tiyan e, heçî nizanî, ew heywan e
 1473 Mamikê mino, pîra qirmîçî, darik di qûnê da
 1474 Mamikê mino, pîra te ya mirî, ya di mêzerê werkirî, di kendal sorî rakirî
 1475 Mamikê mino, pireka di rê da, hezar kelem di rêkê da
 1476 Mamikê mino, pirt-pirt dikim, ker-ker dikim, hindî dixwim, qed têr nabim
 1477 Mamikê mino, qama wê ya kewê ye, barê wê yê devê ye
 1478 Mamikê mino, qelew e keltor, ji der ve ye por, nayête xwarin, ta nekin nav ava şor
 1479 Mamikê mino, qesra bêder, sê perde ketine ber, du spî ne yek zer
 1480 Mamikê mino, qesra du derî, ji binî tê hilçûm, li serî min got: Ellah û Ekber
 1481 Mamikê mino, qesra spî ber derî
 1482 Mamikê mino, qevdek giya, li pişt çiya
 1483 Mamikê mino, qulleteyna tijî av, mareke reş li nav, teyreke spî li hindav
 1484 Mamikê mino, quncê tarî berf lê dibarî
 1485 Mamikê mino, quncikê tarî, nûr lê barî
 1486 Mamikê mino, Qurana dimdimî, tête xwarinê, nehête xwendinê
 1487 Mamikê mino, rengîno li erdê raxistiyo, paşê li ser vezeliyo
 1488 Mamikê mino, reş e şirîn, em pê ve mirîn, neşên te hilgirîn
 1489 Mamikê mino, reş e wek bizin, hûr e wek erzin, mîr û hakim ji ber dilerizin
 1490 Mamikê mino, reş e wekî qîr, difirît wekî tîr, kutilkan çê diket wekî dayîka mîr
 1491 Mamikê mino, reş reşê ga ye, virvira tira ye, bêhna wê bêhna tûla ye
 1492 Mamikê mino, reş reşê ga ye, virvira tira ye, bêhna wê, bêhna tûla ye
 1493 Mamikê mino, reşo siwar bû, kulfetê malê pê şa bû
 1494 Mamikê mino, revendek hatî li deştê, her birrek heştê heştê, çûne milan hatine çilan
 1495 Mamikê mino, rûto ji ûrto dibe, pûrto ji rûto dibe
 1496 Mamikê mino, şalê te şelwarê te, xizmê mala xalê te, bête mala te, tû dê çi deyê
 1497 Mamikê mino, sar e bi deng e, ne xuya ye, nayê girtin û bê deng e
 1498 Mamikê mino, sê bira hene, yek hindî dixwet têr nabît
 1499 Mamikê mino, sê cara pênc, pazde. Dike çend
 1500 Mamikê mino, sê ling û sê dar, çar ling pê da, du pê hat û hîmek lê da
 1501 Mamikê mino, sê mêvan tîn bo te, yekî dihewînî, duwa nahewînî
 1502 Mamikê mino, ser avê nûs, bin avê nûs, çarçeng û fil û fengenûs

- 1503 Mamikê mino, ser bê zad e, her digire û pê dade, çi fayde nade
- 1504 Mamikê mino, ser darok e, bin darok e, yê di bin de tirî û rêya bizirokê
- 1505 Mamikê mino, ser derzî stûn mazî, ber çeman diket gazî
- 1506 Mamikê mino, ser helhel e bin helhel e, çavzîq û simbêlbel e
- 1507 Mamikê mino, ser şeh dawî das, Ehmeqo de bêje dîk
- 1508 Mamikê mino, ser şehîd e, bin mela
- 1509 Mamikê mino, ser ve dep e dep nîne, bin ve dep e dep nîne, hêka dike mamirk nîne
- 1510 Mamikê mino, ser ve req e ber nîne, bin ve req e dar nîne. Hêka dike mirîşk nîne
- 1511 Mamikê mino, serê dinê binê dinê, du guhî tinê
- 1512 Mamikê mino, serê wê şax e, nîveka wê zer e, binê wê ax e
- 1513 Mamikê mino, serevraz diken xalî dibît, sernîşiv diken tijî dibît
- 1514 Mamikê mino, serî di te da, nêvî di kerê da, kok di erdê da
- 1515 Mamikê mino, serî dişidînim bin vedibît
- 1516 Mamikê mino, serî mist e, binî rist e
- 1517 Mamikê mino, serî şeho, terî daso
- 1518 Mamikê mino, serî sorê qiyametê, binî behra elametê
- 1519 Mamikê mino, serî sorî elametî, binî sorî qiyametî, şil diximê ziwa derdikeve
- 1520 Mamikê mino, sermasî li kaş û kendala dibazî, dikir hewar û gazî
- 1521 Mamikê mino, şeş ben û benik, du nan û kutilk
- 1522 Mamikê mino, şeş çav in, sê ser in, du panî
- 1523 Mamikê mino, şeş in nabin heft
- 1524 Mamikê mino, şêst û du ker, şeş çav û şeşguh û sê ser
- 1525 Mamikê mino, şev têt şemal têt, gah têt gopal têt, nik padîşah û sultan têt
- 1526 Mamikê mino, sêva nermbûyî, heşt nanê nevebûyî
- 1527 Mamikê mino, şevê xemilîne, rojê vemirîne
- 1528 Mamikê mino, seyê ne tajandî, berxê ne mêjandî, mêrga ne çêrandî
- 1529 Mamikê mino, seyê ne tajandî, berxê ne mêjandî, mêrga neçêrandî
- 1530 Mamikê mino, sî hêkan bi dev hildigire
- 1531 Mamikê mino, sih siwar çûne gundekî, her malekê sih siwar gehîştinê
- 1532 Mamikê mino, şikefta reş tijî gayê beş
- 1533 Mamikê mino, şimînê darqûn, anko dibêjim, şimin e dar li qûn e
- 1534 Mamikê mino, şimşimê kor e, bi şev derdikevît, şevê diçe jor e
- 1535 Mamikê mino, şinahiya wê nayê xwarin, koka wê tê xwarin
- 1536 Mamikê mino, singê di kevir de qutayî, cotekî gulka vê da berdayî
- 1537 Mamikê mino, sîq û sîq, heşt ling û du pîq
- 1538 Mamikê mino, şîrînok li darînok, darînok li guhbelok, guhbelok bi rê ket, pê pahnok bi dû ket
- 1539 Mamikê mino, siwarê hespê ye, çavê her kesî lê ye, kes nizane qismetê kê ye
- 1540 Mamikê mino, siworê ziqziqî, sed û bîst û pênc, têtjikên di zikî
- 1541 Mamikê mino, sofiyê çavkildayî
- 1542 Mamikê mino, sor dikim, kur dikim, di binê diya babê te re dikim
- 1543 Mamikê mino, spêdê li ser çaran diçe, nîvro li ser duwar diçe
- 1544 Mamikê mino, spêdê ta êvarê, axê bi serê xwe da dike, derdikeve wekî bûkan
- 1545 Mamikê mino, spî ye ne keşk e, guhbel e ne mişk e, biharan terr e, payîzan hişk e
- 1546 Mamikê mino, tenûra axîni, dûkêşka darîni, bû buhurkek çermîni
- 1547 Mamikê mino, tenûra dadayî, tijî kilorên badayî
- 1548 Mamikê mino, tepek li ser tepekê, tê da marê gezekê, ser da konên roviyan
- 1549 Mamikê mino, teqoreqo, kinca dişo

- 1550 Mamikê mino, teqteqê diket, reqreqê diket, karê bejn û balayê diket
 1551 Mamikê mino, têrakirin sinnet e, anîn û birin ferz e
 1552 Mamikê mino, teyr difirît, pûş li mila
 1553 Mamikê mino, tîr çerm e, kevan çerm e, diberdin pê, tê li difinê dikeve
 1554 Mamikê mino, tiştê min heye, hindî dixwet têr nabît
 1555 Mamikê mino, tiştê min miz e hinar nîne, yê di behrê de xewas nîne, ew kulîlk e bihar nîne
 1556 Mamikê mino, tiştê min heye, geş e bêhnxeş e
 1557 Mamikê mino, tiştê min heye, ji qûnê dixwe, ji dev diavêje
 1558 Mamikê mino, tiştê min heye, serî di dîwar de ye, binî di hundur de ye
 1559 Mamikê mino, tumkê di tehtî da, nesîbê însanan hemî tê da
 1560 Mamikê mino, vî alî dîwar, wî alî dîwar, heta sibê dike hewar
 1561 Mamikê mino, vî alî perçîn wî alî perçîn, nav da kewa gogerçîn
 1562 Mamikê mino, vî rexî aş, wî rexî aş, di nav da kerek qumaş
 1563 Mamikê mino, vî rexî kaş wî rexî kaş, din av da topek qumaş
 1564 Mamikê mino, vî rexî pencere ye, wî rexî pencere ye, li nîvekê morî mercan e
 1565 Mamikê mino, vî rexî text wî rexî text, nav da merê bêbext
 1566 Mamikê mino, we zer e wekî hêkerûnê, we xwar e wekî daska dirûnê, bêje da aqil bête şûnê
 1567 Mamikê mino, xaniya maniya, ferşê devê kaniya, rê nadet beniya
 1568 Mamikê mino, xaniyê bê dîwar e, bi stûn e karîte ne, bi ban e bê ax e
 1569 Mamikê mino, xişt û xişt çû cem derî rûnişt
 1570 Mamikê mino, yê mirî ye, cangî dibîne
 1571 Mamikê mino, yê mirî ye, mirov rê dike aqarî
 1572 Mamikê mino, yê mirî ye, xwînê ji vir heta Alokani dirêje
 1573 Mamikê mino, yek çengî tijî xanî
 1574 Mamikê mino, yek e nabe du
 1575 Mamikê mino, yê mirov dinê, bi pênc şahidan ve
 1576 Mamikê mino, zerwêle zerwêle, berfê bikêle
 1577 Mamikê mino, zik li ser zik, darik di devê tizik
 1578 Mamikê mino, zil bi zîwan, nexş li nîvan, ne gawir e, ne îslam
 1579 Mamikê mino, zir çî ne, kevil hene, mî tune
 1580 Mamikê min ê mamanî, leşkerê xala girt dora mala
 1581 Mamikê min û maman e, deng tê denganeke tê, diçe ser serê dara û tê, diçe binê behran û tê
 1582 Mamka mino, çil çilî bin devî
 1583 Mamkê min berekat, terkek li te da, qarên ji te hat
 1584 Mamkê min ê mamanî Bazina xezalê gêr bû newalê
 1585 Mamkê min ê mamanî Çêlekoka zerik ji xwe re di gere
 1586 Mamkê min ê mamanî Çil çik in, çil berçik in çil ode ne çil kilîle ne
 1587 Mamkê min ê mamanî Ez çûm şikeftê min darek rast nedît ez bigirim bi destê xwe
 1588 Mamkê min ê mamanî Ez ji tehtê de diavêjim naşikê ez diavêjim kulekukê de dişikê
 1589 Mamkê min ê mamanî Hespê boz kir toz
 1590 Mamkê min ê mamanî Hilindo milindo kurek ji babê bilindo
 1591 Mamkê min ê mamanî Ji hire heta Mûsil hemî morîyên sinsil
 1592 Mamkê min ê mamanî Ji şikêrê ye ji têrê ye ji rêrê ye
 1593 Mamkê min ê mamanî Keçika dukezî serbanan ve bezî
 1594 Mamkê min ê mamanî Ker zirî kuşpil firî
 1595 Mamkê min ê mamanî Komkirî barê gakê vekirî weke çiyakê
 1596 Mamkê min ê mamanî Mezela şuştî û miştî du feqên çavreş tê de rûniştî

- 1597 Mamkê min ê mamanî Pirtika karê li ser guhê darê
 1598 Mamkê min ê mamanî Qesra spî bê derî
 1599 Mamkê min ê mamanî Reş e reş e wek qîr difire wek tîr
 1600 Mamkê min ê mamanî Reş e reş e wek qîr, kutilka çêdike wek mala mîr
 1601 Mamkê min ê mamanî Rojê bûk e şevê pepûk e
 1602 Mamkê min ê mamanî Sergelgele bingelgele çavzîq û simbêlbel e
 1603 Mamkê min ê mamanî Serhilû ye ne mar e, grêkodel e ne dar e, giya dixwe ne dewar e
 1604 Mamkê min ê mamanî Sermişar e, pêxepar e, heçî nezane dewar e
 1605 Mamkê min ê mamanî Şikefta tarî teji tê de miranî
 1606 Mamkê min ê mamanî Şil bike, rep bike, tê re bike
 1607 Mamkê min ê mamanî Sindirûka li ser sindirûkê mifte ya li destê bûkê
 1608 Mamkê min ê mamanî Sînîya savarê ya li ser guhê darê
 1609 Mamkê min ê mamanî Tiştî tiştanî di nêv mîzera siltanî ji bilî Xwedê kes nizanî
 1610 Mamkê min ê mamanî Tu girê didî diçe, tu berdidî disekine
 1611 Mamkê min ê mamanî Yekê got ayy! milê minoyekê
 1612 Mamkê min ê mamanî Zerik goştî, girar qîrînî, hesko darînî
 1613 Mamkê min ê mamanî, Mamê bi lingikê diçe şerê gundikê
 1614 Mamkê min ê mamanî, Ser text e, bin text e, di nêvê de pîrek bê bext e
 1615 Mamkê minê mamanî, çêlekoka zerik ji xwe re digere
 1616 Mamkê minê mamanî, du stûn gulte, dan ber şaş û perên bavê te, her bî cîzvîza diya te
 1617 Mamkê minê mamanî, ferxî sax mak mirî
 1618 Mamkê mino mamanî bê ling û bê pehnî, ji xwe de diçe ser banî
 1619 Mamkê mino mamanî çûme niwalekî, nalenala birîndarekî
 1620 Mamkê mino mamanî: derîyê her tiştî
 1621 Mamkê mino mamanî: dest û tilî çermanî, xwe hiltavêje zirçanî
 1622 Mamkê mino mamanî: erebê reş ê dondayî, xwe li stûyê diya te badayî
 1623 Mamkê mino mamanî: ez dihilnim weke gayekî, ez dideynim weke çiyayekî
 1624 Mamkê mino mamanî: ez hire diçinim, ew wê de henê şîn dibe
 1625 Mamkê mino mamanî: hespê boz, kire toz
 1626 Mamkê mino mamanî: ji wir heta Mûsil, benikê sinsil
 1627 Mamkê mino mamanî: ji zikê dîya xwe derdikeve, piştî bavê xwe dixwerîne
 1628 Mamkê mino mamanî: me bînderek hilanî, genim ji kayê pirtir anî
 1629 Mamkê mino mamanî: mêzera siltanî, ji Xwedê pê ve tu kesî nezanî
 1630 Mamkê mino mamanî: sê birareş fe dikin hev
 1631 Mamkê mino mamanî: yê difroşe xwe nake, yê xwe dike jî nabîne
 1632 Mamkê mino sûr hişin e, bajar sor e, mifte hasin e
 1633 Mamkê mino sûrhişin e, bajar sor e, mifte hasin e
 1634 Mamkê mino, hakim yê dibin bergûza ve
 1635 Mamkê mino, ka çû ma dan
 1636 Mamkê mino, kêçê kuçek/kevirek kir
 1637 Mamkê mino, keçkê spîndarek rakir
 1638 Mamkê mino, kerê kerr çû afir
 1639 Mamkê mino, li cihê xwe rûdine ranabe
 1640 Mamkê mino, mar e ne mar e, xurcîk li milan e ne etar e
 1641 Mamkê mino, mil li te ve
 1642 Mamkê mino, pismîrê bi şepkekî
 1643 Mamkê mino, sê bira daîmî difekin

- 1644 Mamkê mino, teyr firî bêçeng
- 1645 Mamkê mino: apê sincik, bazda quncik
- 1646 Mamkê mino: av e ne av e, marê mirî nav de, dîkê zêrîn silav e
- 1647 Mamkê mino: bager dezî, li palê bezî
- 1648 Mamkê mino: bapîrê min kuta pîrka te
- 1649 Mamkê mino: bav ciwan, kur rihspî
- 1650 Mamkê mino: bê ruh her tiştî dibêje
- 1651 Mamkê mino: bê ruh ruha dibezîne
- 1652 Mamkê mino: bê serî û bê ling, diherike li bajar û gund
- 1653 Mamkê mino: behra şîn e, av tê nîn e
- 1654 Mamkê mino: behrê kef da, masî çiv da, lal xeber da
- 1655 Mamkê mino: bejna wê bejna bûka: hêka wê hêka çûka
- 1656 Mamkê mino: bena sûlavê, pênc çiqil ji belavê, sisê li sihê, dido li tavê
- 1657 Mamkê mino: bi pel û strîn e, li ber dilê bilbil şêrîn e
- 1658 Mamkê mino: bi pişt e, bê zik e: bi dest e, lê bê ling e: bi dev e, bê diran e: bi çav e, lê nabîne
- 1659 Mamkê mino: bihara bûk e, havîna sûk e: pehîza pepûk e
- 1660 Mamkê mino: binî şîn e, serî spî ye, kulav zêrîn e
- 1661 Mamkê mino: binî şîr e vedixwim, ser mêrg e diçinim
- 1662 Mamkê mino: bira û bira tirba hev dikolin
Mamkê mino: birakê min heye, ji mal derdikevim ji dûv min naqetê, direvim dide dûv min, didime dûv
- 1663 direve
- 1664 Mamkê mino: birayek e, qesrekî ava dike
- 1665 Mamkê mino: bizina belikal, bazda çû ser kuç, min berik danîyê hate xwar
- 1666 Mamkê mino: bizina kal e, li ser mal e, ne didoşin, ne difroşin
- 1667 Mamkê mino: bizina kal, ser girê Evdal, hir ho dikim, hey ho dikim, nayê xwar
- 1668 Mamkê mino: bûka etara xemilî, benî guhera
- 1669 Mamkê mino: bûka Mîrê Hesena, heft kur û heft keçê destan e, ne şîr e, ne pizwan e
- 1670 Mamkê mino: buxçika çekê mekê, ji Xwedê pê ve kes nikare vekê
- 1671 Mamkê mino: çala li bin xanîya, ket destê zebanîya
- 1672 Mamkê mino: can li ser bi can, bi can li ser bê îman
- 1673 Mamkê mino: çar bira ne, çar dîyar in: yek germ, yek hînik, yek şîlî û yek jî sar
- 1674 Mamkê mino: çar birayê pev re direvin, lê nikarin bigihin hev
- 1675 Mamkê mino: çar çêkê, du mêkê, heştê balatirê
- 1676 Mamkê mino: çar çeç in çeçîn dikin, du belbelîn dikin, hezar û yek bawêşin dikin
- 1677 Mamkê mino: çar kanîyên bireka, av jê anîn zîreka
- 1678 Mamkê mino: çar leklek û dido liçliçok, yek fişfişok
- 1679 Mamkê mino: çar li erdê, du li teniştê, qûn li ser piştê
- 1680 Mamkê mino: çar ling e, çav spehî ye, tenişt belek e
- 1681 Mamkê mino: çar lingê hespî li erdê ye, du lingê wî li tenista hêsp e, qûna wî li ser piştê hêsp e
- 1682 Mamkê mino: çar lingê wê erdê, du ji teniştê, kir zika ve, qûn ser piştê
- 1683 Mamkê mino: çar pî ye, ava rê ye
- 1684 Mamkê mino: çarsim axa, li nav taxa
- 1685 Mamkê mino: çav nîn e rê ve dice: ling nîn e dewesê dihêle
- 1686 Mamkê mino: çav spehî ye, dil nazik e, çar ling e, ne ker e
- 1687 Mamkê mino: çavek heye, serî nîn e
- 1688 Mamkê mino: çavilbûk, simbêlbirnêz
- 1689 Mamkê mino: çaviya min a şûştî û veşûştî, xatunek tê de rûniştî

- 1690 Mamkê mino: çavzero, simbêlbelo: ser dîwarê hembero
 1691 Mamkê mino: çêlekoka zerik ji xwe re digere
 1692 Mamkê mino: çeqmeq e, leq û peq e, heçiyê destê xwe lê bide ehmeq e
 1693 Mamkê mino: çi li deştê bit çi li nav beran, çi li ber qurmên dar û beran
 1694 Mamkê mino: cihê gayê sor lê dimexele
 1695 Mamkê mino: cihê sima gayekî, hinga dinyayekî
 1696 Mamkê mino: çil çit e, çil ber çit e, çil ode ne û çil mifte ne
 1697 Mamkê mino: cil tax in, çil bertax in, çil kuçik in, çil ocax in
 1698 Mamkê mino: çil tilî, çil neynok, du can û nefesek
 1699 Mamkê mino: çindik çindik, bazda quncik, bê dil û bê gurçik
 1700 Mamkê mino: çivçivi, nav devi
 1701 Mamkê mino: çix belanokê, bazda pêşîya bûkê
 1702 Mamkê mino: ço kero, hevsar zero, dû min wero
 1703 Mamkê mino: çolê şîn e. sûkê reş e, malê sor e
 1704 Mamkê mino: çû kunê de ne mar e, pûrtê pê ve ne kar e
 1705 Mamkê mino: çûme çolê çolbeyarkî, heft dûv li pey berankî
 1706 Mamkê mino: çûme ji vê rê û pê de, tişteki di rê de, lingê li ser pê de
 1707 Mamkê mino: çûme şikeftekî, tijî bizinên çal
 1708 Mamkê mino: çûme şikeftekî, ya tijî tîteçî, yekî wisa nîn e bibime coti
 1709 Mamkê mino: çûme wê dera jorî, berazekê xenzîrî, çokên wî piştâ helbirî
 1710 Mamkê mino: dar devi, lêv tifigî, ne ji darê, darê xulekî
 1711 Mamkê mino: dara nivê deştêwa, pel hûr û pel xwêwa
 1712 Mamkê mino: dara tûyê dikolin, denga dikine navê, guhê wê ba didin
 1713 Mamkê mino: darika sûlavê, pênc çiqil diçine wê navê, sê sihê, dido tavê
 1714 Mamkê mino: dava dêzî, kendêl ve bezi
 1715 Mamkê mino: devê xwe re vedixwe, pozê xwe re vedireşe
 1716 Mamkê mino: ez çûm ser latekî, pîyê min ket çalekî
 1717 Mamkê mino: ez çûm şikeftekî, tijî sofîyê serspî
 1718 Mamkê mino: ez çûme êş, ezabek hate pêş. bi hest linga, ji xeynî keleş
 1719 Mamkê mino: ez çûme mala mîr, pirsiyar dikim ji mirovên pîr, kê dîtîye teyrê bişir
 1720 Mamkê mino: ez çûme malekî, mirmira du şêra
 1721 Mamkê mino: ez çûme rêkekî, mamê mişt ji wê ve tê, piştîyê li nîva piştê
 1722 Mamkê mino: ez çûme rêleka dar bi dar, qet darek wê nebû bikime destar
 1723 Mamkê mino: ez çûme şikeftekî, tijî bizinê kol ê ker ê hoşim, xweşdoş im, lê nikarim bidoşim
 1724 Mamkê mino: ez tehtê de tavêjim naşkê, ez tavêjim kulekokê dişkê
 1725 Mamkê mino: mamê min ê rû kurkirî, şev û rojê darvekirî
 1726 Mamkê mino: mamê min tê ji deştê, darek strî li piştê
 1727 Mamkê mino: min re radibe, min re rûdine, hinga diçe nagihimê
 1728 Mamkê mino: pîyana Şamê erdê ket, din dinê ket
 1729 Mamkê mino: roj xulam e, şev xanim e
 1730 Mamkê mino: rojê bela ye, şev kela ye
 1731 Mamkê mino: serî re rê diçê, binî de êr çêtkê
 1732 Mamkê mino: şevê razam hewş tijî bû, sibê rabûm yek jê nemabû
 1733 Mamkê mino: şevê yar e, rojê neyar e
 1734 Mamkê mino: sûka wê mezin e, bazar pê re nabe: yê diçinê zêde ne, yê hatî nîn in
 1735 Mamkê mino: zevîyek e çiqas tu kur dikî, dîsa şîn dibe
 1736 Mange sor, şak ber jor

1737	<i>Marê mirî tirkî kirî</i>
1738	<i>Marê mirî, deng jê birî</i>
1739	<i>Marê mirî, erd qul kirî</i>
1740	<i>Marê mirî, tîrî kirî</i>
1741	<i>Marhulîsê di kurê da dilîze</i>
1742	<i>Masî çiv da, behrê kef da, nal sekinî, dil xeber da</i>
1743	<i>Masî nîne lê tim deryayê de ye</i>
1744	<i>Me çandî wekî nokan, Şîn bûn wekî sêvelokan</i>
1745	<i>Me çandî wekî nokan, şîn bûn wekî sêvelokan, pê ve hatin wekî gûzelokan</i>
1746	<i>Me çandin wekî nuka, şîn bûn wekî sêveloka, pê ve hatin wekî gûzeloka</i>
1747	<i>Mehîna boz, Li meydanê kire toz</i>
1748	<i>Mehîneka sipî, reşikên wê şîn</i>
	<i>Mela û jina xwe, qeşe û jina xwe, mamosta û jina xwe divên li rûbarî bi gemiyê ku bê xwedî ye û tenê du</i>
1749	<i>kesan digire derbaz bibi</i>
1750	<i>Mela ye, mela nîn e</i>
1751	<i>Melayê li ser birînê, ji derd û kulan re dixwînê</i>
1752	<i>Mele bi şaşkî, çil ga çûne aşkî</i>
1753	<i>Mele ye mele nîn e, aqilmend e, ruh tê nîn e</i>
1754	<i>Mele ye şaşik nîne, aqilmend e ruh tê nîne</i>
1755	<i>Melle gote mellejinê, go: "Kitêbek derketiye rû dinê, usa hûr e, nayê xandinê</i>
1756	<i>Mencela çiftê, qirpên keftê</i>
1757	<i>Mencela Hembelî, birrêne ya dikelî, ne agir e ne xwêlî</i>
1758	<i>Mêr e ji baranê dibizde, ji germê bi xwe de dimîze</i>
1759	<i>merê lingekî, hat şerê gundekî</i>
1760	<i>Mêrga şîn, tijî helal û beybîn</i>
1761	<i>Mêrgeşîn mêrgeşîn, du siwar tê de xuşîn, yek hesp e yek mehîn</i>
1762	<i>Mêrgeşîn, mêrgeşîn, Du siwar tê de xuşîn</i>
1763	<i>Merî bulut, derî kilît</i>
1764	<i>Metelok metête, Qeşey rîte devê te</i>
1765	<i>Metelok û metelok, qûna te dikim mencelok, avkên bana, şilqa li xwe didet, yê dibeme Duhok</i>
1766	<i>mêvan hatine gundê me, her mirovekî bo çûn</i>
1767	<i>Mexel tê pez tune, dimeşe şop tune</i>
1768	<i>Mêzera Sultanî, bê dest û pê çû ser banî</i>
1769	<i>Mêzera sultanî, tijî sêvên zemanî</i>
1770	<i>Min avêt avê neşikya, min avêt çiya şikya</i>
1771	<i>Min avêt çiya neşikiya, min avêt avê şikya</i>
1772	<i>Min darekê 2 gulte, da nav lingêt babê te, li wê ra hebû qîçqîça da/diya te</i>
1773	<i>Min ecêbek dît di rê de, kê mak dîtiye di zikê bavê de</i>
1774	<i>Min hulek havête dolekê, dol dirya hul ne</i>
1775	<i>Min ji dûr ve dît kevirek, çûm nêzik çar ling û seriyek</i>
1776	<i>Min ji dûr ve dît kevirek, çûm nêzik çarling û seriyek</i>
1777	<i>Min li dikanê kirî hebek, anî malê bû hezar heb</i>
1778	<i>Min tiştekek heye tişt e, ne ber e ne pişt e, jina Emoyê gişt e</i>
1779	<i>Min tiştekek heye, mîr û hakim pêş ve radibin</i>
1780	<i>Min tişteki dîtî, du reng av di nav de dişimîtî</i>
1781	<i>Min xalek heye li ser zûrî, ser e mezintir e ji ûrî/zig</i>
1782	<i>Min xwêhkî heyî, illeh enirî</i>

1783	<i>Mînanî kala, xwe pala</i>
1784	<i>Minara sor e di bin erdê de</i>
1785	<i>Mîr hilgirtî ye dirî</i>
1786	<i>Mirî mirov li serê digirî</i>
1787	<i>Mirî sax derdikeve, sax mirî derdikeve</i>
1788	<i>Mirîşka dirûnê/rûdinê, radibe hêk nake</i>
1789	<i>Mirîşka min çû kepir e, zîrça xwe bû şekir e</i>
1790	<i>Mirîşka min çû kepirê, zîrça xwe bû şekirê</i>
1791	<i>Mirîşka reş kibab e, çiyê bixot seba e</i>
1792	<i>Mirov di behrê da namirit</i>
1793	<i>Mirovê bi lingekî çû şerê gundekî</i>
1794	<i>Mirovek çû ser erd. Av li ser erd tune bû. Kûpikê av li ser kerê girêdayîbû û ker winda bûye</i>
1795	<i>Mirovekî gurek, mihek û cihalekê cihê hebû, dixwest li rûbarî derbaz bibit</i>
1796	<i>Misîniko, du quliko</i>
1797	<i>Mizgefta maliştî, du feqe tê d rûniştî</i>
1798	<i>Mizgefta maliştî, du feqe tê de rûniştî</i>
1799	<i>Morî kişiya, erd hejiya</i>
1800	<i>Mûtê bê pût e, dixot û narîte</i>
1801	<i>Mûyê du karika, avêtine ser du darika</i>
1802	<i>Mûyê karan, li ser daran, di bin de disitirin, bi hezaran</i>
1803	<i>Mûyê serê darê ye</i>
1804	<i>Mûyê/pûrtê kara, li ser dara</i>
1805	<i>Mûyên karan, li ser daran, di bin de distirin bi hezaran</i>
1806	<i>Nanxur û pênc pêçî</i>
1807	<i>Nav mîna navê tazî, toponî mîna topono xîştiro</i>
1808	<i>Navê wî zerbenduk e, yê bi kulav û dersok e</i>
1809	<i>Ne bi ber ve ye, ne bi pişt ve ye</i>
1810	<i>Ne çandî li ser pişt ne zay, ne zay li ser pişt bê ruhî, bê ruh li ser pişt bê îmanî</i>
1811	<i>Ne derî ne cobarî, hesinê hesavdarî</i>
1812	<i>Ne deriyê wê heye, ne jî pacê wê heye</i>
1813	<i>Ne deriyê wî heye, ne jî pacê wî heye, tê û diçe</i>
1814	<i>Ne dest e lê wek hev e, ne şe ye wek melêv e</i>
1815	<i>Ne dest e lê wek hev e, ne şe ye wek melêv e, pehn dibe bi erdê ve, mirov dipîve gav e</i>
1816	<i>Ne dixwe ne jî radizê, bi şev û rojê dixebite, tu carî nasekine</i>
1817	<i>Ne dixwe ne radizê, ne bîn digire ranaweste, ew bê razan û west e</i>
1818	<i>Ne kend e ne lend e, bi kendê ve bend e, bizane çi ye û çend e</i>
1819	<i>Ne ker e, ne hêstir e, bar ji qalibî mezintir e</i>
1820	<i>Ne ker e, ne maker e, hefsarî bide ser e, hêdî hêdî li berî herr e</i>
1821	<i>Ne kes dikare bixwe ne dikare bipîve</i>
1822	<i>Ne li Ademî ye, ne li Cinnî ye, qasidê beyna xelkî ye</i>
1823	<i>Ne li erd e ne li esman e, hêlîna beg rewan e</i>
1824	<i>Ne li erd e ne li esman e, hêlîna bet rewan e</i>
1825	<i>Ne li erd e ne li esman e, hukmê destê însan e</i>
1826	<i>Ne li erd e ne li esman e, mifte li destê însan e</i>
1827	<i>Ne li erd e, ne li esman e, hêlîna begrewan e</i>
1828	<i>Ne li erda ne li esman e, hêlîna kesrewan e</i>
1829	<i>Ne li erdê ye ne li ezmanan e, hefsarê wê dest însanan e</i>

